

# Peşew li Silêmaniyê behsa tirsaxwe ya mezin kir

[Newzad Mehmûd](#)

25/05/2012 07:54:00



Şêrko Bêkes: Peşew dibistaneke ziman e.

Silêmanî (Rûdaw) - Berî destpêkirina wê, dergehên salonê hatin girtin û cih ji bo li ser piyan jî nema, çend mamosteyên zanîngeha Silêmaniyê, ji ber nebûna cihan li ser piyan rawestiyabûn, ku hinek ji wan jin bûn. Gava

helbestvanê navdar û ser û rih spî yê kurd Ebdulla Peşew ji dergehê xwarê hate hundir û ji ber xirecira kameramanan bi kotekî karibû bimeşe, bi lêxistina çepikan pêşwaziya wî bi germî hat kirin.

Li hola biçûk ya Raperîn li zanîngeha Silêmaniyê, yek ji xwendekarên beşê ziman li zimanê kurdî gotinek pêşkêş kir: “Em kêfxweş in ku ew rûmeta mezin bû para me ku mêvandariya helbestvanê mezin Ebdulla Peşew li Silêmaniyê bikin.” Heya dema ku ji bo dikê hat vexwendin, hemû beşdarên hewl didan riyekê bibînin ji bo maçkirin û girtina wêneyekî li gel Peşew.

Gelek kes li derveyî holê mabûn ji ber nebûna cihan li hundir û bi dilên şikestî vegeriyan. Tavgeh dibêje, ev heftiyekê hatina vê rojê dijmêre: “Da ku ji nêzîk ve Peşew ê mezin bibînim.” Lê biçûkbûna holê xewna Tavgehê têk bir. Tavgeh yek bû ji xwendekarên zanîngeha Silêmaniyê ku dixwest ev ne semînera dawî ya Peşew li Silêmaniyê be.

Di pêşiya destpêkirina semînerê de, Peşew got: “Cara borî gava hatim, semînera min ya yekê li Hewlêrê bû, min got vê carê divê semînera min ya yekê li Silêmaniyê be, lê çenebû.” Lê kêşeya Peşew li her cihêkî Kurdistanê ew e, li çepika xistin û hawarên nişandana hezkirinê, nahêlin gotinên xwe bi tevahî bike. Car caran di nav holê de dengê bilind dibû û digot: “Bi qurbana te bim.”

Serdana vê carê ya Peşew ji bo Herêma Kurdistanê û nemaze hatina wî ji bo Silêmaniyê, qasî ku ji bo

şewirkirina hinek pirsên neteweyî bû, ewqasî ne ji bo xwendina “Şev nîne we di xew de nebînim” û “eşq” û helbestên din yê navdar bû. Bi rastî cihêkî girîng jî hîlbijartibû da ku tirsaxwe ya dilê xwe eşkere bike. Ew tirsaxwek bi xwe digot: “bi berdewamî min azad dide” tirsaxwe jî nav çûn û wêranbûna zimanê kurdî.

Berî rojekê, 14.05.2012an keçekê di rûpela xwe ya taybet de li ser Facebookê derbarê serdana Peşew nivîsbû: “Silêmanî dixweş û serbilind e bi pêşwazîkirina helbestvanê kurd yê mezin Peşew.”

Li Silêmaniyê Peşew got “gelekî ditirsim”, dû re tirsaxwe kifş kir, ku girêdayî nemana zimanê kurdî ye: “Gava ziman tune dibe, êdî hemû tişt ji dest diçe, çiku bêyî ziman, netewe û dewlet dirust nabin. Ditirsim çend salên din em ji hev fêm nekin, çiku dixuye kodên zimanê kurdî ji nav diçin.”

Peşew qala nivîsarên li ser dikan û bazaran kir, qala kitêbên dibistanan kir, qala diyalog û nivîsandina rojname û kovaran kir, qala xemsariya hikûmetê li hember xema zimên, kir. Peşew li Silêmaniyê daxwaza damezrandina akademiya zimanê kurdî kir.

Mamosteyê zanîngeha Silêmaniyê Heval Ebûbekir ku her zû xwe gihand Peşew û di dema semînerê de jî çavên wî tije hêsir bûbûn, ji Rûdawê re got: “Çiqasî min xweşî wergirt ewqasî jî min xem xwar, çiku bi rastî beşek ji giliyên mamoste Peşew li gel me bûn, ne tenê li gel hikûmet û desthilatê. Mezinahiya Peşew di wê yekê de derdikeve, ku helbest û gotinên wî derbarê ziman û neteweyê hev temam dikin, ew çiqasî helbestvanekî mezin e, ewqasî jî zimanzan û pisporekî zîrek e di warê zimên de.”

Di semînerê de Şêrko Bêkes nehat dît. Bêkes derbarê amade nebûna xwe di semînerê de ji Hewlêrê ji Rûdawê re daxuyand ku ew bi projeyekê li bajarê Hewlêrê ye û lewma nikaribû amade bibe: “Peşew helbestvanekî hêja ye ku girîngiyê herî zêde daye ziman, ew bi tena xwe dibistaneke ziman e. Pêwist e helbestvanên ciwan Peşew bixwînin û jê fêm bikin, da ku zimanê kurdî fêm bikin û bi başî fêrî vî zimanî bibin.”

Piştî zêdeyî 40 xulekan ji behskirina pirsaxwe netewe, ziman û helwestên wî, Peşew got, dest bi xwendina helbestên xwe dike, hemû beşdar bi lêdana çepikan rabûn ser piyan; bi “Serbazî win-leşkerê wînda” dest pê kir û heya derengî êvarê ciwan, keç û xort û xwendekarên zanîngeha Silêmaniyê sermest kirin.